



Agahdarî di derbarê perpûna parastina koronayê

Perpûna parastinê ya COVID-19

Bi awirekî, rastîyên sereke:

- Perpûna koronayê ji bo we, belaş in. Amadekirin û cîbicîkirina wî, nêzikî saetek dajo.
- Hûnê, di navbera çend hefteyan da, du perpûnê werbigrin. Heftetek piştî perpûna duwemîn, dijî şewba koronayê parastinê çêdibe.
- Hûnê bêne agahdar kirinê, ka kîngê dema perpûnkirina we ye.
- Hûn nikarin, bi rêya tîlefônê an jî yekser di awahîyên navenda perpûnkirinê da, randevûyê werbigrin.
- Berê her kesî, kesên ji komên xwedî risk û her weha jî karmendên lênihêrinê û tendûristiyê, wê bêne perpûnkirinê.
- Ger piştî perpûnkirina koronayê, li ser we bandorên wê hebin, serî bi navenda perpûnkirinê an jî bi bijîşkê malbatî lêdin.

Hedefa perpûna parastina koronayê

Hedefa perpûneke, parastina hember nexweşîyek taybetî ye. Divê perpûna parastina koronayê, hember nexweşîya COVID-19 biparêze, an jî pêşî li raborîna nexweşîya giran bigre.

Bi perpûnkirinê ra, di beden da madeyên bi navê antîkor pêktên. Ev antîkor, dikarin patojên kifş bikin û pergala parastina me teşwîq bikin; da ku patojên bê zîrar be. Ji ber vê yekê, kesên perpûnkirî, dikarin di rewşên enfeksiyonê da berê her tiştî li dijî şewba koronaya dagirker tevbigerin û pêşî li ber COVID-19 bigrin, an jî nexweşîyek ewqas giran neborînin.

Ji ber çî, divê hûn bîn perpûnkirinê?

Ne pêwîst e, ku hûn bîn perpûnkirinê, perpûn kirin ne mecbûrî ye. Ew tê wê wateyê, ku divê hûn bi xwe biryarê bidin, gelo dixwazin perpûn bibin an na. Lê çend sedemên perpûna parastina koronayê heye. Perpûn, we bi xwe û însanên me yê dinê ji nexweşîya COVID-19 diparêze. Bi tenê, ger gelek kes perpûnê werbigrin, wê hejmara kesên nexweş yê COVID-19 kêmbibe, bi wî awayî pandemî di dawiyê da derbas bibe. Ne pêwîst e, ku ji bo perpûnê pere bidin.



Dora perpûnê - Kî û kingê bête perpûnkirinê

Maddeya perpûnê, halî hazir kê m e, lê hatîye destnîşankirinê ku kî û dê kîngê, dikare bête perpûnkirinê. Kesên ku herî pir hewceyî perpûnê ne, berî ewê bêne perpûnkirinê. Kesên temen mezin (ji 60 salî mezintir), kesên ku mirovên nexweş û pêdiwîya alîkarîyê ne, wan mêze û derman dikin; kesên ku peywendîyên wan bi însanên ducanî ra û bi kesên pêdiwîya lêniherîne û her weha ji mêj ve nexweşîyên wan hebin.

4 komên perpûnê hene. (1 heta 4) Hûnê di tabloyê da bibînin, ka bi kîjan komê ve girêdayî ne:

Koma perpûnê ya 1an Pêşîneya herî berze	Koma perpûnê ya 2an Pêşîneya berze	Koma perpûnê ya 3an Pêşîneya berze kirî	Koma perpûnê ya 4an
Temenê ji 80 salî mezintir	Temenê ji 70 salî mezintir	Temenê ji 60 salî mezintir	Mirovên bi tendûrist, temen ji 60 salî kêmtir
Nîştecihên awahîya kal û pîran û lîniherîne	Mirovên xwedî demens, astengdarên derûnî, nexweşîyên masûlkeyan û giyanî ya giran, bi wan ra hene	Kesên ku ji mêj ve nexweş in (nexweşîya dil, şekir û hwd.)	
Karmendên awahîyên lêniherînan, ya bi şev û roj, nîv razandî û li ser lingan	Nexweşên penceşêr û pişikê, mirovên xwedan index girseyî ya laş > 40	Karmendên ku di dezgehên bijîşkî yê kê m xeter da kar dikin	
Karmendên ku li awahîyên tendûristî, yê ku xetera pir mezin lê hene, kar dikin	Nexweşîya şekir bi awayeke giran, an nexweşîya berdewam ya kezeb an jî gurçikê	Mirovên ku di saziyên hikûmetê da desthilatdar in	
Karmendên tendûristîyê, yê ku xema kesên xetera berze dikin	Nexweşên piştî neqla organan	Mirovên ku di şirket û binesaziyên krîtik da desthilatdar in	
	2 kesên, ku bi ducanîyan ra û bi kesên pêdiwîya lêniherîne ra, peywendîyên xurt heye	Kesên ku di bazirganiya firotanê ya xwarinê da dixebitin	
	Karmend an nîştecihên awahîyên penaberan, an jî mirovên bêmal	Karmendên ku di dezgehên zarok û ciwanan da û her weha di dibistanan da kar dikin û gruba perpûna 2an da cih negirtine	
	Karmendên ku di awahîyên lêniherîna zarokan, di lêniherîna rojane û di dibistanên seretayî, taybetî da kar dikin	Kesên ku ji ber şert û mercên kar û jîyanên wan, xetera enfeksiyonê zêde bûye	
	Karmendên berpisîyar ji bo kesên astengdar ên derûnî		
	Bijîşk û karmendên din, yê ku bi nexweşan ra têkiliyên berdewamî heye, xizmetguzarên xwîn û plazma bexşandinê, hekîmên selametî ya ku xetera pir mezin		
	Polês û karmendên bicîhkirina qanûnê yê ku bi rîskek mezin a enfeksiyonê		
	Kesên xizmeta tenduristiya gel		

Çavkanî: <https://corona.rlp.de/de/impfen>



Perpûnkirin li ku derê pêktê

Di vê katî da, bi tenê li navendên taybet yê ku ji bo perpûnkirinê hatine avakirin, perpûnê werbigrin. Karmendên ku li stargehên penaberan û awahîyên lênihêrînê kar dikin, ji bo perpûnkirina wan, dê tîmên mobîl biçin awahîyên wan. **Di qonaxa duwemîn da, divê perpûnkirin li ofîsên bijîşkan da bêkbê.**

Randevû:

Ger hûn, niha di stargehekê penaberan da niştecih in, an jî kar dikin, karmendên tendûrîstîyê dê werin stargehê, da ku perpûnkirina we cîbicî bikin. Di vê rewşê da, ne pêwîst e ku hûn ji navenda perpûnkirinê randevûyê werbigrin. Bi kerema xwe, ji awahîyê ku hûn niştecih in, bipirsin.

Bi gotineke din, ger hûn di mala xwe da dijîn, wergirtina randevûya perpûnê, bi eyaletê ku hûn li wir dijîn, girêdayî ye. Di hin eyaletan da, hûnê bi rêya postê, nameya vexwendinê werbigrin, an jî ji karsazê we dê we agahdar bike. Ger nameyeke vexwendinê ji we ra hatibe, hûn dikarin bi înternetê an jî bi tîlefônê randevûya perpûnkirina xwe çêbikin. Eyaletên din, li ser malperan û di çapemenîyê da agahîyan belav dikin, ka kî û kingê, dikare bête perpûnkirinê.

Wergirtina randevûyê, bi pirani li ser online portalê ya eyaletan tête cîbicîkirin: <https://www.impfterminservice.de/impftermine> An jî bi rêya tîlefônê, li ser vê hejmarê: 116 117.

Agahdarîyên berfireh ji bo randevûyan, dikarin di rûpela eyaleta xwe da bibînin:

Ji kerema xwe, ger randevûya we hebe, wî çaxê biçin navenda perpûnkirinê. Ger randevûya we hebe, hûn dikarin li wir bêne perpûnkirinê!

Ger hûn perpûnê naxwazin

- Temenê we ji 16 salî piçûktir be,
- Hûn ducanî bin (ger rîska we ya enfeksîyonê zêde be, wek mînak: ji ber qada çalakîya xwe, bi bijîşkê xwe ra bipeyîvin, da ku rêjeya rîska perpûna koronayê bikêşin)
- Agirê laşê we hebe an
- Alerjîya we, ji ber madeya perpûnê hebe.

Belgeyên ku ji bo perpûnê pêwîst in

Ji bo perpûnê, divê hûn, delîlên kesayetî, yê wekî nasname an jî pasaport bi xwe ra bînin. Ji bo kesên niştecihên stargeha penaberan û awahîyên lênihêrînê, ew awahî belgeyekê pêşkêş dikin. Kesên ku ji ber pişeya xwe, dikarin perpûnê werbigrin, divê ji karsazê xwe belgeyekî bistînin.

Ji kerema xwe, **pesendkirina randevûya perpûnê û ger hebe, pasaporta perpûna xwe û karta bîmeya nexweşiyê, bi xwe ra bînin.**



Perpûnkirin bi wî awayî bi rêva diçe

Berê pêşîn, karmendên bijîjkî dê daneyên we yê kesane kom bikin. Piştra bijîjkekî/a, bi awayekî berfireh, di babeta perpûnê da dê we agahdar bike û şîreta li we bike.

Ger hûn xwe nexweş hîs dikin an jî ducanî ne, alerjîya we hebe, berê bi perpûnek tehamûl nekiriye, an jî di 2 hefteyên dawî da perpûneke din wergirtiye, ji bijîşka xwe ra bibêjin.

Hûnê bêne perpûnkirinê, ger hûn bi awayekî êşkere perpûnê pesend bikin û ger alozî derneketibin pêş. Berê ewil, forma daxwaza perpûnek, bi îmza we bête pesendkirinê, paşê hûnê bêne perpûnkirinê.

Rêvabirina perpûnê dişibe perpûnkirinê din: Bi piranî, derzî li jora çengê we lêdidin. Berîya çûyîna we yê malê, ji bo çavdêriyê, hûnê nêzikê 30 deqeyan di oda çavdêriyê da bimînin. Bi wî awayî tê pesendkirin, ku hûn baş in.

Ji bo ku madda perpûnê encam bide, divê hûn du caran perpûnê werbigrin. Di navbera perpûna yekemîn û duwemîn da, divê çend hefte biborin. Bi wî awayî, madda perpûnê bi tevayî encameke baş nîşan dide. Rêvabirina perpûna duwemîn, bi rêvabirina perpûna pêşîn ra, wek hev e.

Her çiças, hûn piştî perpûnkirina duwemîn, hember nexweşîya COVID-19 hatine parastinê jî, di bin rewşeke dinê da, dikarin hîn şevbayan belav bikin û bi kesên din bialînin. Ji ber vê yekê, girîng e ku hûn piştî perpûnkirina duwemîn jî, berdewamî qaîdeyên paqijî cîbicî bikin: Her wekî berê, maskeyan bikar bînin, pir caran destên xwe bişon û ji kesên din dûr bisekinin.

Reaksiyonên perpûnê û bandorên wê

Piranîya mirovan, baş tehemulî perpûnê dikin. Lê belê, li cem hîn kesan piştî perpûnkirinê nîşanên êşên sivik tên dîtin. Wek mînak: Di cihê perpûnê da werimandin, sorbûn an jî êş; agirê laş, betilandin, serêş an êşên li seranserîya laş, îshal an jî vereşîn.

Lê belê, ev reaksiyon nîşanên baş in, ku perpûn encam dide. Bi gelemperî, piştî du rojên perpûnkirinê, ew derdikevin holê û kêman jî yek-du rojan pitir berdewam dikin.

Heta wê katî, kêman caran bandorên dijwar û xetera jîyanî hatine xûyakirinê. Lê belê, piştî perpûnkirinê êşên durûdirêj an jî bandorên encam giran, pêş ve biçin, divê bi lez têlêfonê bijîşkek bikin.

Ji bo agahiyên zêdetir

Ji bo pirsên ser babeta perpûnê, hûn dikarin bi navenda perpûnlêdanê ya **Wezaretê Tendûristiyê a Federal ra peywendî çêbikin: 116 117**

[Bundesministerium für Gesundheit: Informationen zum Impfen](#)

[Integrationsbeauftragte der Bundesregierung: Informationen zum Coronavirus in unterschiedlichen Sprachen](#)

[Robert Koch-Institut: Infoblatt zur Corona Impfung mit Vektorimpfstoffen](#)

[Robert Koch-Institut: Infoblatt zur Corona Impfung mit mRNA-Impfstoffen](#)